

Azadîa rastî çi ye?

Ji zemanê berê zalim xelkê xû tirsandin u tepeser dikirin. Zalimê nî eve ne:

Benîto Musolînî (hikmî li Îtalîe kir 1922-1943)

Cosef Stalin (hikmî li Rusîe kir 1922-1953)

Edalf Hitlir (hikmî li Almanîe kir 1933-1945)

Fîdel Kestro (hikmî li Kube kir 1959-2006)

Sedam Husên (hikmî li Îraqê kir 1979-2003)

Li ser perê 3 tu dê li ser zalimekî kevin xwîn – Fir'ewn, melîkê Misrê. Demê wextê pêxember Musa Fir'ewnî hikmî li Misrê kir. Musai hemî Cihî (Îsraîlîa) ji destê wî xilas kirin (nêzîkî sala 1440 jiberî deykîna 'Îsayê Mesîhî).

“Bi hêzî dî'ete xirabkirin. U bi hêzîa bijîn bê guman dî'ete xirabkirin.”

“Sedamî hêzê xû stretegîa xû ya leşkerî amadet kirin li jîrbêjî, niştimanî bu xelkê wî, yan kêmtir e ji hemîa, bikêmîve bu parastinê resen. Wek hemî tiştê dî, planê wî ew bîn be bu wî bi xû kir ba yan navdarîa wî li dever u hêza wî bi hêztir bin. Ewî karî kir bes bu navdarîê u hêzbîna xû...”

(pêra 13, *Saddam's Secrets*, Iraqi General Georges Sada and Jim Nelson Black, © 2006)

Wekî hîn welatê xû carek dî ava kin, her dem li bîra we bit ku pêtivî ye li binyatê hejêkirnê ya ne li ber xû bi tinê.

He ya guh lê bî, ku ya gutî: Hê ji nêzîkê xû bikin u kerbê xû ji dujminê xû vekin. Belê ez

dibêjime we, hê ji dujminê xû bikin u ew kesê nefreta li we dîkin pîruz bikin, ewê nehezi ya we dîkin digel wan dibas bin u nivêja bu wan kesê nehezi u zolmê we dîkin da bibine kurrê Babê xû ewê li esmanî, ewê roja xû li ser baş u xiraba dihelînit u baranê li ser bêgunneh u gunnehbara dibarînit. Ma çi xelat dî hindê da ye, ku hîn hê ji wan bikin yê hîn divên? Ma bacgir jî vê çendê nakin? U heke we bi tinê silavî birayê xû kir, erê ma tu tiştê jî karê rewîstê pitir dikî? Ma peyker perês jî her we nakin? Bê kêmasî bin herweku babê we yê esmanî yê bê kêmasî.

- Mizgînîa Mettî 5:43-48

Heta hîn – xelkê 'Îraqê – bi resen hê ji cîranê xû bikin, azadîa rastî ya sîasetî naête naf we da. Heta Behdînî u Soranî u Sirîaî u Kaldanî u Ezîdî u Turkoman u 'Erebê Sunî u 'Erebê Şî'a fêr bin bi rastî hê ji êk u dû bikin, azadîa rastî ya sîasetî naête naf 'Îraqê da. Heta serukê 'Îraqê karî bu xelkê 'Îraqê ne kin u harî karîa xelkê sivil bikin ne bes ber xû bin u bes bu desthelatîa xû karî bikin, azadîa rastî ya sîasetî naête naf 'Îraqê da.

Azadîa rastî dest pê dîkit bi kesîn. Hîvîa “kesek dî” ne ke heta hê ji cîranê xû bikî u xizmeta cîranê xû bikî. Evruke dest pê bike.

“Pisîar ne ke welatê min dişê bu min çê dîkit, belê pisîar bike ez bu welatê xû çî bikim.” (Can F. Kenedî)

“‘Îraq wekî hemî welatê Rojhelata Navîn rast ku li ser gendelî u nehejêkirin u gimankirin u tirsandinê ze'îf kir bî - hemî tiştê şulê xirab. Belê supas bu Xwidê ku rejêma Be'es u Sedamî li ser hikmî helweşa u Sedam ne ma, çunku hikmê wî li ser tuzeka nerim hat bî avakirnê. U wekî Incîl dibêjî, bi tinê xanî li ser bera hate avakirnê dimînit. ”

– Corc Sada, Ceneralêk u firukevanek li leşkerê berê 'Îraqê, 2006